گۆڤارا زانستێن مرۆڤایەتی یا زانکۆیا زاخۆ
مجلة العلوم الانسانية لجامعة زاخو
Humanities Journal of University of Zakho (HJUOZ)
Vol. 6, No. 1,Part 2, pp. 358– 371, Mar-2018
journals.uoz.edu.krd
hjuoz.uoz.edu.krd
p-ISSN: 2410-7557
e-ISSN: 2518-5128

# ŞOREŞA ŞÊX EBDUSSELAM BARZANÎ (1908- 1914)

Yaşar Kaplan

Akademîsyen, Zanîngeha Hakkari, Fakulteya Îlahiyatê, Beşa Dîroka Ayînan

**Wergirtin: 12. 2017 / Pesendkirn: 03. 2018 / Belavkirin: 03. 2018** https://doi.org/10.26436/2018.6.1.598

**PÛXTE:**
Malbata Barzan ya binyadê wan dîgehîte tradîsyona Neqşebendî- Xalidî, berê ji xebatên xwe yên wekî îro yên siyasî zêdetir bi xebatên îrşada ayînî cih girtibûn. Di destpêka sedsala XXan pê ve ji bilî çalakiyên xwe yên deverê yên ayînî û çandî, dest bi xebatên siyasî û polîtîk kirin. Di nava malbata Barzan da yekemîn kesê dest bi xebatên siyasî- polîtîk kirî Şêx Ebdusselam Barzanî ye. Li dor vê çendê Şêx Ebdusselam ji ragehandina Meşrûtiyeta II. heta berbanga Şerê Cîhanê yê Yekemîn li ser bizava Kurdî ya netewî gelek xebatên siyasî pêk înane. Di dema van bizavan da Şêx Ebdusselam û eşîreta Barzan ya di bin serkêşiya wî da li hemberî Dewleta Osmanî ya di bin rêveberiya Îttîhad û Tereqiyê da, hatine hemberî hev û gelek mucadele kirine. Di encama van mucadeleyan da Şêx Ebdusselam ji aliyê Dewleta Osmanî ve hatiye girtin û ji aliyê Waliyê Mûsilê Silêman Nazîfî ve li sala 1914ê li Mûsilê hatiye sêdarekirin. Di vê xebatê da di bin ronahiya belgeyên arşîvên Osmanî yên destê yekê şoreş û bizava Şêx Ebdusselam Barzanî ya digel rêveberiya Îttîhad û Tereqiyê û pêşveçûnên siyasî yên rêka sêdarekirinê jibo wî vekirî, dê bêne nirxandin.
**Peyvên Sereke:** Kurd, Dewleta Osmanî, Barzan, Şêx Ebdusselam.

## DESTPÊK

Gundê Barzan gundek e ser bi qeza Mêrgesor ya girêdayî Bajarê Hewlêrê ya ser bi Herêma Kurdistanê/Îraqê. Yekemîn kesayetiyê berniyas yê Malbata Barzan ya di dîroka deverê da gelek karîger bûyî, Mela Ebdullahê kurê Mela Mihemedî ye. Mela Ebdullah îcazetnameya xwe ya ilmî ji destê alimê Îslamê yê navûdeng Mela Yehyayê Mizurî (1773- 1838) wergirtiye (1834)[1] û li gundê Barzan medreseyek ava kiriye û dest bi tedrîsata ayînî kiriye. Mela Ebdullah bi navê Ebdurrehman, Ebdurrehîm û Ebdusselam sê kur hebûne. Mela Ebdullah kurê xwe Ebdurrehman yê paşî leqeba Taceddîn wergirtî jibo tedrîsata ayînî rêkiriye Nehriyê li nik Seyîd Tahayê Nehrî. Paş mirina babê xwe Ebdurrehman şûna babê xwe rûniştiye. Bi vî awayî cara ewilî terîqeta Neqşebendî di Barzan da kate daye. Paş mirina Şêx Ebdurrehman birayê wî yê biçûk Şêx Ebdusselamê Iê li şûna wî runiştiye. Hinek berhemên Şêx Ebdusselamê Iê yên Erebî û Kurdî hatine nivîsîn gehiştine roja me. Şêx Ebdusselam li sala 1872yê çûye ber rehma Xudê û du kurên bi navê Mihemed û Qasim paş xwe hêlane.[2] Piştî Şêx Ebdusselamê Iê kurê wî Şêx Mihemed li şûna babê xwe rûniştiye. Şêx Mihemed li sala 1903yê wefat kiriye û li paş xwe bi navê; Şêx Ebdusselam, Şêx Ehmed, Mihemed Sidîq, Babo û Mela Mistefa pênc kur hêlane. Bi vî awayî Şêx Ebdusselamê IIyê di temenekî ciwan da (dema hatiye sêdarekirin derdora 30 saliyê bû) li şûna babê xwe bûye sergêrê Tekya Barzan.

Di serdemên kevin da Barzan gundek bû ser bi Eşîreta Zêbarê ve.[3] Şêx Ebdusselamê Iê jî vê çendê di qesîdeya xwe ya Kurdî da piştrast diket[4]. Eşîreta Zêbarê ji aliyê Çemê Zê yê Mezin ve hatiye jêk cûdakirin. Ji van parçeyan ya dikevîte bakûrê Çemê Zê ya gundê Barzan jî tê da û ji derdora bîst gundan pêk têt wekî Berojî tênê binavkirin. Jibo gundên Zêbariyan yên dikevine başûrê Çemê Zê jî navê Nizarî tête bikaranîn. Erdên Tekya Barzan lê karîger yên 'eslî deverên Şêrwan, Mizurî Bala, Berojî û Nizarî yên binyad Zêbarî, bû. Lê belê dawiya serdema Şêx Mihemed û destpêka serdema Şêx Ebdusselamê IIyê pê ve Herkiyên Xwecih yên devera Mêrgesor û Gerdî Jêrî jî beşdarî tifaqa Barzan bûn.[5] Şêx Ebdusselam rêzereformek pêk îna. Li dû vê çendê; "erd li cotyaran hate belavkirin, next, qelen û şûkirina bi zorê hate qedexekirin, her gundekî mizgeftek hate çêkirin û ev dere wekî navenda çalakiyên ayînî û civakî hate bikarînan, li her gundekî jibo çereserkirina kêşeyan civatek hate danan û her gundekî hêzeke leşkerî ya bergiriyê hate destnîşankirin"[6]. Şêx Ebdusselam Barzanî hem bi van reformên xwe ve hem jî jiber hêza xwe ya ayînî, polîtîk û leşkerî di serê sedsala XXan da di nava civaka Kurdî da cihekî payebilind bi dest êxist.

Xebatên Şêx Ebdusselam Barzanî yên ayînî û siyasî, rastî serdema serdestbûna Partiya Îttîhad û Tereqiyê (1908- 1918) ya li ser dewletê têt ku naziktirîn û girîngtirîn serdemek e di dîroka Osmanî da. Her çend ev partiye di bin dirûşmên wekî "dad, wekhevî, azadî" hatibîte avakirin jî mebesta wan ya esasî jinûve parastin û rizgarkirina xweserî û yekgirtina coxrafî ya Dewleta Osmanî bû.[7] Partiya Îttîhad û Tereqiyê 23yî Tîrmeha 1908ê bi ragehandina meşrûtiyeta II. ve desthelatdarî êxiste destê xwe û dest bi rêveberiyeke tund, zordar û otorîter kir. Îttîhad û Tereqiyê ji sala 1912an wê ve polîtîkaya Osmaniyatiyê hêla û polîtîkaya Tirkîniyê bi pêş ve bir. Yanî bi kurtî verêjên netewperest yên neşiyayî rê lê bigirin, jibo dewletê wekî hêmanekî xilasker dîtin û polîtîkaya Tirkîniyê meşandin.[8] Partiya Îttîhad û Tereqî di hukûmetên dişiyan tedaxulê tê da biken da, di mijara jibo Rojhilata Navîn rêkirina waliyên nêzîkî xwe û yên bi payeyên awarte ve bi hêz êxistî, hessasiyet nîşan didan.[9] Vê tercîha wan rêberên ayînî û siyasî yên Kurd yên klasîk û nûnerên Îttîhad û Tereqî yên deverê tûşî êkudu dikir.

### Çalakiyên Şêx Ebdusselam Barzanî Yên Salên 1909 û 1910

Piştî ji aliyê Ordiya Hereketê ve tepisandina raperîna 13yî Nîsana 1909ê (Weqaya 31î Adarê) ya li hemberî rejîma Îttîhad û Tereqiyê, rengê otorîteriya rêveberiya Îttîhad û Tereqiyê gav bi gav zêde bû. 27î Nîsana 1909ê Sultan Ebdulhemîdê IIyê ji textî hate ladan. Dewlet di şertên rewşa awarte da hate rêvebirin. Di herêmê da derketina pêş ya Şêx Ebdusselamî wekî dijberekî Îttîhad û Tereqiyê û hêza wî ya ayînî û siyasî, rêveberên Osmanî yên herêmê ne rehet dikir. Li ser hinek tehrîrat û telgrafên li ser aloziyên di destpêka sala 1909ê li Wîlayeta Mûsilê yên di navbera eşîretên wekî Barzanî û Hemewendiyan û rêveberiya Dewleta Osmanî, bi nivîsîna tezkîreyekê jibo Nezareta Herbiyê ve çûna Muşîrê Ordiya IV. Ebdullah Paşa û heta waliyek tête diyarkirin çûna Fazil Paşa ji Bexdayê jibo Mûsilê hate xwestin[10]. Fazil Paşa li devera Kerkûk û Silêmaniyê jibo tenkîlkirina Eşîreta Hemewend, Dîwana Herbî Orfî ava kir. Sê heyîv piştî

Weqaya 31î Adarê, ji aliyê hinek rêberên ayînî yên wekî Musilman, Mesîhî, Yahûdî û Keldaniyan û hinek giregirên devera Akre û Zêbarê ve bi rêkirina hinek telgrafên jibo Serbazê Ordiya Hereketê Mehmûd Şewket Paşa, Sadrazam û Meclîsa Meb'ûsanê ve, herwekî Şêx Ebdusselam bi hêzên derdora xwe komkirî ve dever êxistiye bin destê xwe û kiryarên kirêt yên wekî kuştin, xesb û talanan diketin, şîkayeta Şêx Ebdusselamî hate kirin. Kesên şîkayeta Şêx Ebdusselamî dikirin di berdewamiya nameyên xwe da digotin heke dewlet me ji destê wî xilas neket em hemî dê serê xwe jibo wî çemînîn û deshilatdariya wî qebûl bikeyn.[11] Hebûna hinde Xeyrî Muslîman di nava şîkayetkeran da cihê şikê ye. Çunkî W. A. Wîgramê di heman salan da li Wîlayeta Wan û Mûsilê geriyayî û hevdîtin digel Şêx Ebdusselamî pêk înayî radigehînît ku Şêx digel hêmanên Mesîhî gelek baş serederî dikir û jiber vê çendê wekî Şêxê Mesîhiyan dihate nasîn.[12]

Babi Alî ya ji rûdanan xeberdarbûyî jiber têrênekirina hêzên leşkerî yên mewcûd jibo pêkînana aramiya di deverê û têkbirina hêzên Şêx Ebdusselamî, jibo rêkirina hêzên pêdivî ji Nezareta Herbiyê ra fermanên pêdivî rêkir.[13] Hêzên leşkerî yên Mûsilê jibo Akrê[14] hatine rêkirin, di 21î Tebaxê ji aliyê hêzên Şêxî ve hatine têkbirin û hinek bi çekên xwe ve dîl keftine destê Şêxî[15]. Vê çendê rewşeke nazik di herêmê da peyda kir. Di telgrafa jibo agahîdanê ya derheqê mijarê da ya ji aliyê Serbaziya Ordiya VI. ya Bexdayê ve jibo Babi Alî hatiye rêkirin da hatiye gotin ku; li ser telgrafa Waliyê Mûsilê ya 27î Tebaxê rêkirî wesa tête têgehiştin serhildana Barzan wekî bizaveke îrtîcaî' (paşverû) li hemberî Meşrûtiyetê ye, hejmara kesên beşdarî serhildanê bûyî derdora çar hezaran e, eşîretên Wanê (Sencaxa Hekarî) jî beşdarî serhildanê bûne û heke bi rêkirina hêzên leşkerî ve tedbîrên pêdivî nehêne wergirtin ev rewşe dê karîgeriyê li ser eşîretên dî jî biket[16]. Di telgrafeke dî ya hatiye hinartin da jî hate ragehandin ku meseleya Barzan mezin bûye, mufrezeyeke çil neferî ya jibo deverê hatiye sewqkirin bi hemî çekên xwe ve keftiye destê serhildêran da û divêt derhal hêzên leşkerî yên nû bêne rêkirin. Ji bilî vane ev bizave wekî bizaveke paşverû hatiye destnîşankirin û hatiye diyarkirin, serhildêr Sultanê nû qebûl naken û dixwazin Sultanê keftî (Sultan Ebdulhemîdê IIyê) dîsa deynine li ser textî.[17] Piştî van rûdanan ji Fazil Paşayê jibo têkbirina Eşîreta Hemewend li Kerkûkê dima hate xwestin, bi leşker û muhîmata pêdivî ve berê xwe bidete devera Akrê û desthilatdariya dewletê li wê deverê dîsa peyt biketin[18].

Li ser vê çende Walî û Qumandanê Mûsilê Fazil Paşa bi destekî sivik 27- 28î Tebaxê du tabûr piyade û çar topên çiyayî yên Ordûya IV. ya li Çemçemalê wergirtin nik xwe û 30î Tebaxê ji Kerkûkê gehişte Akrê.[19] Berî Paşa bigehîte deverê, mufrezeya Mûsilê ya ji pênsed neferan pêk dihat hatibû wê deverê û jibo rizgarkirina tabûra redîf ya Zêbarê ya di bin dorpêça Şêxî da dest bi şerî kiribû lê belê sernekeftibû û mecbûr mabû xwe bikêşîte gundê Dînarte. Dema Fazil Paşa digel hêzên gehiştî êkudu ve ji gundê Dînarte ber bi Zêbarê ve hereket kirî hêzên Şêxî îstîhqamên xwe berdan û xwe kêşane devera Barzan ya bakûrê Çemê Zê. Bi vî awayî zabitên tabura redîf yên Zêbarê hatin rizgarkirin. Ji agahiyên ji van zabitan hatine standin têtê têgehiştin, Şêxî li ser navê Sultanê keftî (Sultan Ebdulhemîd) xutbe dida xwendin[20]. Piştî beşdarbûna hêzên eşîretên harîkarên dewletê çar top, du tabûr peyade û bi hinek hêzên eşîretên harîkar ve heta spêdeya 3yî Îlonê Çemê Zê hate derbazkirin û piştî çend lêkdanan hêzên Şêxî hatin belavkirin û roja 8î Îlonê daxilî gundê Barzan bûn[21]. Fazil Paşa bi telgrafek dî ya jibo Babi Alî rêkirî da, derbarê belavkirina eşqiyayên Barzanê ji aliye hêzên digel wî bi xwe yên ji aliyê başûr ve hatî û bi yekîneyên jêr serbaziya Ebdullah Paşa yên ji Rewandizê hatî û hêzên ji Şemdînan hatî sewqkirin ve û derbarê revîna kesên belavbûyî ber bi cihên asê yên Çiyayê Şirîn yê dikevîte pişta gundê Barzanê hukûmet agahdar kir. Ji bilî vane fîrara Şêx Ebdusselam bi xwe bi du mirovan ve û êdî nemana çi îmkanên wî yên kombûn û serxwevehatinê jî lê zêde kir[22]. Fazil Paşa hind ji serxwevenehatina Şêxî piştrast bû ku di nivîsa jibo Nezareta Daxiliyê rêkirî da gotibû pêdivî bi rêkirina leşker û topên ji Ordiya IVê yên dê hatibane rêkirin nîne[23].

Piştî te'qîbatên leşkerî yên li devera Barzan, Şêrwan û Mizurî Bala yên li dûv çekdarên Şêxî yên belavbûyî çend lêkdan çêbûn û ji mirovên Şêxî yên pêşketî Feqe Ebdurrehman, Hacîk û gelekên dî hatine kuştin û nêzîkî sed kes jî wekî dîl hatine girtin. Şêx Ebdusselam bi xwe jî çûye nik Se'dî Axayê reîseşîrê Eşîreta Pinyaniş li nahiya Çelê ya ser bi Sencaxa Hekarî ya girêdayî Wîlayeta Wanê û li wê derê jî ji aliyê Se'dî Axa ve hatiye hîmayekirin û li gundê Zawîte yê Musliman yê li devera Tuxîbê ya Mesîhî xwe veşartiye[24].

Fazil Paşa piştî temamkirina herekata leşkerî jibo girtina Şêxê xwe li nava sînorên Wîlayeta Wanê veşartî, ji Nezareta Herbiye rêkirina fermanên pêdivî jibo Wîlayeta Wanê xwest û derheqê pêwîstiya bicihkirina du top û tabûrekê li Barzan û bicihkirina mufrezeyekê li Şêrwan digel mudîrekî xudan şiyan, Babi Alî agahdar kir[25]. Piştî hîngê du top û du tabûrên redîf yên leşkerî li Barzanê û bêlûkek leşkerê nîzamiyê li navenda Nahiya Şêrwan bi cih kir û paşî jibo rêvebirina karûbarên wîlayetê vegerî Mûsilê. Fazil Paşa di heman demê da jibo xweserêkveneînana Şêxî û jibo bidestneêxistina nufûza xwe ya berê, bi israr rêkirina hêzeke leşkerî ji aliyê Wanê ve li ser Çelê ya Şêxî xwe tê da veşartî xwest. Lê belê jiber demsala zivistanê ev daxwazên wî bi cih nehatin[26].

### Hewa Şêx Ebdusselam Barzanî ya Muqabil

Piştî vegerîna Fazil Paşa jibo Mûsilê Şêx Ebdusselam digel sê sed zelamên reîseşîrê Eşîreta Pinyaniş yê nik wan mayî, xwe kêşa nêzîkî devera Barzan û bi hêzên eşîretên Hêtût, Mizurî Bala, Nêrwe û Şêrwanê ve gehiştine êk[27]. Di rojên dûmahiyê yên Kanîna Biçûk ji nişka ve çûne li ser Barzan û êrîş birine li ser tabûrên li Barzan hatî bicihkirin û zerer û ziyaneke gelek mezin gehandine wan. Qismekî gelek kêm yê ji van hêzên leşkerî şiyan birevin devera Akre û Zêbarê û xwe xilas biken[28]. Li ser vê çendê zexîre û cebilxaneya van tabûran û ya ji hemiyan muhimtir du top gehiştine destê Şêxî. Fazil Paşa li hemberî xurûca Şêxî ya ji nişka ve şaş û hêbetî ma. Di nivîsa xwe ya jibo Nezareta Herbiyê rêkirî da şaşbûna xwe wiha tînîte ziman: "jinûve komkirina hêzê ya Şêzê Barzanê û perîşankirina leşkerî û zebtkirina çek û cebilxane û kuştina gelek zabitan karekî gelek girîng e. Dema ez li nivîsên xwe yên berê yên li ser perîşankirina Şêx Ebdusselamî bi rengekî neşêt çi carên dî bi ser xwe ve bêt û neşêt hêzekê kom biket, tînim bîra xwe rewşa niha derkeftî pêş me tiştekî ecêb e. Pênehesîna zabitên li wê derê ji peydakirina hêza Şêxî ya li dora xwe komkirî heta ku bişêt du tabûr leşkerî perîşan biket birastî xefleteke gelek mezin e"[29]. Li ser vê çendê di bin serbaziya Muhyeddîn Paşa da hêzek hatiye rêkirin lê belê jiber demsala zivistanê û çekên gehiştiye destê Şêxî tiştek pê çênebûye. Fazil Paşa ji Nezareta Herbiye; sewqkirina alaya peyade, bateryeya çiyayî û bêlûka mîtralyozê yên aîdê Ordiya IVê ya li Diyarbekrê tête rawestandin ber bi vî alî ve, rêkirina du tabûran ji aliyê Wanê ber bi başûr ve û daxwazkirina komkirina hêzên harîkar ji eşîretên Şemdînan ji endamê E'yanan Seyîd Ebdulqadir Efendiyê wê gavê bi mebestekê li Nehriyê amade, xwest[30].

### Navbeynkariya Seyîd Ebdulqadirê Nehriyê

Seyîd Ebdulqadirê Nehrî nivîsek jibo Nezaretê rêkir û têda pirsa emrê Nezareta Daxiliye kir ya derheqê daxwaza Fazil Paşa ya komkirina hêzên eşîretên harîkar û berdewamiya nivîsa xwe da got; heke Nezaret daxwazeke bi vî awayî biket hîngê jiber zurûfên demsala zivistanê jibo pêdiviyên hêzên eşîretên harîkar divêt jibo meqamên 'eleqedar emrên pêdivî bêne rêkirin[31]. Bi vî awayî xwe gîro kir û dest bi peywendiyê digel Şêx Ebdusselamî kir. Wesa tête têgehiştin hewlên Seyîd Ebdulqadirî yên jibo peydakirina aramiyê di demekî kurt da berê xwe dan. Seyîd Ebdulqadir di nivîsa xwe ya jibo Nezareta Daxiliye hinartî da diyar kir, jiber daxwazên Waliyê

Mûsilê Fazil Paşa yên bi israr ji mirovên xwe yên bijare hêzeke ji pênsed kesan pêk dihêt amade kiriye û heke dexaleta Şêxî û mirovên wî bête qebûlkirin jibo emrê dê bête dane jî amade ye[32]. Dîsa derheqê gotinên Şêx Ebdusselamî yên bi rêka mirovekî xwe ve gehandî Seyîd Ebdulqadirî ku heke dewlet qebûl biket ew bo teslîmbûnê amade ye û xetta hereketê ya dewlet diyar diket derbas nabît û amade ye çek û cebilxaneya bidestêxistî vegerînît, ragehandin[33]. Ji nivîseke Nezareta Daxiliye ya jibo Waliyê Wanê hatiye rêkirin ve daxwaza tehqîqkirina îddîayên wekî Şêxê Barzanê mirovekî heqqaniyetperwer bûye lewra xudan nufûz û giregirê Mûsilê Sabûncu Paşa bûye dijminê wî û ev îftîraya îrtîcaiyê pê ve kiriye û bûye sebebê van rûdanên diltezîn, hate kirin[34]. Wîlayeta Wanê di cewaba xwe da ya daye Nezeretê da diyar kir ku li dû agahiyên pêbawer Şêx terefdarê serhildanê li hemberî hukûmetê nebûye û hindî em pê dihesîn tiştê bûye sebebê te'qîbata leşkerî îftîrayên axawatên Akrê yên encama dijminahiya wan paydabûyî ye û dîsa jî derheqê Şêxî da derbirîna fikreke qet'î ne mumkîn e[35]. Ev çende eşkera diket şîkayetên derheqê Şêx Ebdusselamî yên li Babi Alî hatîne kirin hemî leyîz û pilaneke Sabûncû Paşa û axawatên Akrê ne û jiber vê çendê helwesta Dewleta Osmanî hemberî Şêx Ebdusselamî nerm bû.

**Dijminahiya Fazil Paşa Jibo Şêx Ebdusselamî**

Li hemberî daxwaza amadebûna jibo dexaletê ya Şêx Ebdusselamî Fazil Paşa diyar kir her çend Şêx bi rengekî ku neşêt çi car dî serê xwe bilind biket hatibîte tepisandin jî jiber xwe sipartina wî ya bi Nahiya Çelê ya Hekarê û bi sûdwergirtina ji erdnîgariya deverê û ji zurûfên werzê zivistanê şiyaye xwe xilas biket û sererayî nivîsên di wextî da me çend caran jibo Wîlayeta Wanê jibo girtina Şêxî li wê derê an jî hîç nebît ji wê derê kirnedera wî rêkirî Wîlayetê tedbîrên pêdivî wernegirt û jiber vê çendê jî demeke dirêj li nik Se'dî Ama ma, derfeta xwe berhevkirinê peyda kir û şiya vê herekata dûmahiyê biket û jiber hindê girtina Şêxî gîro bû[36]. Babi Alî di nivîsa jibo Fazil Paşayî rêkirî da diyar kir, heke bêyî tenkîlkirina Şêxî dexaleta wî bête qebûlkirin dê jibo kesên li hemberî dewletê serî hildayî bibîte mînakeke xirab û lewra heke mumkîn bît bi hêzên heyî ve bila bête tenkîlkirin heke munkîn jî nebît jibo qebûlkirina şertên wî yên dexaletê û dûmahî pê înana meselê digel Wîlayeta Wanê pêkve nirxandinên xwe jibo me ragehînin[37]. Fazil Paşa di cewaba xwe ya daye Babi Alî da diyar kir, qebûlkirina dexaleta Şêxî jiber sû-î te'sîrê dirist nîne û çi rê ji bilî rêkirina hêzeke lezgîn ji aliyê Wanê ber bi devera Çelê jibo birîna rêyên revê yên Şêxî rast û diristir nîne. Şiyana xwe jibo tenkîlkirina Şêxî ji aliyê başûr ve ya bi hêzên di destê xwe da diyar kir[38]. Fazil Paşayê Waliyê Mûsilê bi israr berdewamiya nivîsînê jibo diristnebûna qebûlkirina dexaleta Şêxî û daxwaza sewqkirina hêzeke leşkerî ji aliyê Wanê ber bi Nahiya Çelê kir. Li ser vê çendê Babi Alî emrên pêdivî jibo sewqkirina Se'dî Axayê piştî têkçûna ewilî ya Şêxî ew hîmaye kirî û revîna wî sanahî êxistî û îmkana êrîşa dûmayî daye wî, jibo Dîwana Herbê rêkir[39].

Piştî vê çendê Wîlayeta Wanê jibo îfadedanê Se'dî Axa xweste Wanê. Li dû nivîsa ji Wanê jibo Babi Alî hatiye hinartin Se'dî Axa hatiye Culemêrgê. Lê belê hem jiber zêde pîrbûna wî hem jî jiber werzê zivistanê gotîye ez neşêm bême Wanê û jiber vê çendê jî li Culemêrgê di bin çavdêriyê da mana wî hatiye qebûlkirin. Di werzê biharê da digel vebûna rêkan ve rêkirina hêzên leşkerî jibo aliyê Culemêrgê û Çelê hate diyarkirin[40]. Li sererayî van pêşveçûnan hemiyan Fazil Paşa bi nivîsên xwe yên dixwazin Se'dî Axa derhal bête girtin û jibo Dîwana Herbî Orfî bête sewqkirin û rêkirina leşkerî jibo Nahiya Çelê, berdewam kiriye. Li ser vê çendê Muşîriyeta Ordiya IVê ya Erzincanê nivîsek derheqê çi me'na nedana van israrên Fazil Paşa nivîsî. Di nivîsê da wiha hatiye gotin: "li hemberî daxwazên bi israr jibo hereketkirina hêzeke leşkerî ber bi Nahiya Çelê emir hatiye danê. Pêkînana vê herekatê di vî werzî da mumkîn e lê belê bi awayê di halekî perîşan hêlana tabûrekê bi gerandina bi mehan li çel û çiyan ve fedakirina wan çi encamên mifadar nagehînîte me. Bixwe dilsoziya Se'dî Axa digel ehlê nahiyê jibo hukûmeta merkezî ya Wanê pêşçav e û sererayî pêşkêşkirina daxwaza Şêxî ya dexaletê û hebûna şiyana Waliyê Mûsilê jibo bi awayekî bi sanahî bi rêka mesilhetê ve çareserkirina vê meselê hêşta ew bikevîte rikê çi me'na bo vê çendê nahête danê. Çunkî Waliyê Mûsilê yê ehda bi darê zorê girtina Şêxî dayî, jibo pêşîlêgirtina îhtîmala revîna Şêxî ber bi Nahiya Çelê ve, dixwazît ji Wanê ji panzde qonax dûratiyê bi derbazkirina tabûrê li ser çel û çiyayên bilind ve Nahiya Çelê xirab biket. Halbukî ehaliyê Nahiya Çelê hatiye nik hukûmeta merkezî û hûkûmet piştrast kiriye ku dê li ber her emrekî hukûmetê rawestayî bin û heke Şêxê Barzanê li nahiya wan derbas bibît ew dê wî derhal bigirin û teslîmî hukûmetê biken. Ji aliyê dî ve Şêxê Barzanê yeman xwestiye û caba daxwaza dexaletkirina li hukûmetê hinartiye lê belê li ser van halan ra Qumandanê Mûsilê daxwaza qebûlnekirina dexaletê ragehandiye Nezareta Daxiliyê. Telgrafa duhî ji endamên Meclîsa E'yanê Seyîd Ebdulqadir Efendî jibo Wîlayeta Wanê rêkirî da, behsê nivîsîna Şêxê Barzanê ya jibo Seyîd Ebdulqadirî rêkirî ya derheqê amadebûna xwe ya jibo xwe teslîmkirina bi qebûlkirina her teklîf û şertê hukûmetê, tête kirin. Li ser van halan ra hêşta Walî û Qumandanê Mûsilê Fazil Paşa li ser qebûlnekirina dexaletê bi israr e. Hal ev hal e mentiqê hewlên rêkirina leşkerî ji Wanê jibo Nahiya Çelê ya qeza Hekarê aqil tê naçît"[41]. Li sererayî vane hemiyan Fazil Paşa li ser herekata leşkerî ya li ser Şêx Ebdusselamî israr kiriye. Di nivîsa xwe ya jibo Babi Alî rêkirî da, mana Şêxê Barzanê bi mirovên xwe yên hejmara wan derdora sê sed kesî ve li aliyê dî yê Çiyayê Şirînê diyar kiriye û heke em digel gehiştina li wê dere ya tabûra Ordiya IVê ya dê jibo devera Çelê dê bête hinartin ve, pêkve di wextekî da dest bi hereketê biken mumkîn e Şêx bête girtin. Lewra divêt leşker li ser devera Çelê bête rêkirin. Beramberî vê çendê jî Babi Alî di cewaba xwe da ne mumkînbûna rêkirina leşkerî jibo li ser devera Çelê heta dûmahiya heyva Nîsanê diyar kir[42].

**Walîtiya Nazim Paşa ya Bexdayê û Dexaleta Şêx Ebdusselamî**

Nazim Paşayê di navbera 25î Çiriya Paşî ya 1909ê û 15yî Adara 1911ê da waliyatiya Bexdayê kirî, pirofîleke cuda ji rêveberên Osmanî yên heta wê deme, ava kiriye. Di 7î Nîsana 1910ê da Qumandaniya Ordiya VIê li wî hatiye terxankirin û bi payeyên awarte yên wekî te'yînkirin û ji karî wergirtina karbidestên wekî walî û qeymeqaman jî tê da ve, hatiye bihêzkirin[43]. Nazim Paşayî di serdema walîtiya xwe ya Bexdayê da gelek çaksazî di warê aborî, avedanî, gehandin û ewlekariya deverê da kirine. Jibo bi rêka diyalogê çareserkirina pirsgirêkên serhildanên eşîretên Kurdan û Ereban yên li hemberî hukûmetê yên jiber bêdadî û valahiya otorîteyê derkeftî, xebitiye û berê vî karê xwe jî wergirtiye[44].

Dema Nazim Paşa wekî waliyê Bexdayê hatî rêkirin êrîşa Şêx Ebdusselamî ya muqabil pêk hatibû û jiber şertên zivistanê çalakiyên leşkerî rawestabûn û Şêxî jî amadebûna xwe jibo dexaletê diyar kiribû. Di 12î Adara 1910ê Şêx Ebdusselam Barzanî bi îmzaya xwe ve nivîsek jibo Nazirê Daxiliyê rêkir. Şêxî di nivîsa xwe da bi kurtî wiha digot: " îstîrham û feryadnameya xelkê nahiyeyên Barzan, Şêrwan û Mizurî Bala ye. … ji teb'aya Dewleta Aliyê xelkê nahiyeyên Zêbar, Şêrwan û Mizurî Bala yên girêdayî Wîlayeta Mûsilê, jiber rêveberiya xirab ya hukûmeta berê û jiber fesadiya hinek dijminan, rûdanên diltezîn qewimîn. … hukûmeta meşrû bila însaf, merhemet û edaletê nîşê bidet û ji me jî çaverê dilsozî û îtaetê bît. Em rica dikeyn hukûmet bi merhemetê ve dûmahiyê bidete felaket û karesatên mal û bedenê xwe ve me bedel dayî. … heke hun tewbeya me qebûl neken û dîsa jibo nehêlana me bixebitin hîngê hun dê rasta Xudê da berpirs bin. Çunkî li ser dîn, namûs û wijdana xwe em ehd û peymanê dideyn ku ji

niha wê ve em zerera kesê nakeyn. …. Heke hun tewbe û dexaleta me red biken û qebûl neken jî di memalîkê Osmanî da cihekî hun layiq dibînin jibo me destnîşan biken û bo xatira diyanet û İslamiyetê rê bidene me, da erz û eyalê xwe ve derbasî devereke dî bibîn. Heke hun rê neden da ku em ji vê derê derkevîn û meqsed ne islah, nehêlana me bît em dê bibêjîn (înne lîllah înne îleyhî racîûn) û berpirsyarî li ser ser û sebeban heta ku em yek tinê jî bimînîn hindî ji me têt em dê bergiriya canê xwe bikeyn ku em bi şer'î bi vê çendê ve mecbûr în. Di heyama çûyî da teslîmkirina çekên gehiştî destê me ya bi husnî rizaya xwe jiber niyetbaşî û tewbeya me ya ji dil e. …. Em îltîca û dexaleta Babi Alî dikeyn. Şêxê Barzanê Ebdusselam"[45].

Li ser vê nivîsa Şêx Ebdusselamî Nezareta Daxiliye bi nivîsa jibo Wîlayeta Mûsilê rekirî ve nirxandinên wan yên derheqê qebûlkirina dexaleta Şêxî xwest[46]. Li hemberî vê çendê Wîlayeta Mûsilê jî jiber avakirina Dîwana Herbî Orfî ya derheqê kesên jiber serhildana Barzan hatî girtin û kesên bi vê meselê ve eleqedar û lê belê heta niha hêj nehatî girtin, diyar kir qebûlkirina dexaleta Şêxê Barzan û hevalên wî ne dirist e û berevajî vê çendê dê bibîte mînakeke xirab[47]. Dema Nazim Paşa bi girêbûn û astengbûna Waliyê Mûsilê Fazil Paşa jibo çareseriya vê meselê têgehişt, Saffet Beg wekî qeymeqam jibo te'qîbata meseleya Barzan wezîfedar kir. Saffet Beg 23yî Gulanê gehişte Barzan û dest bi xebatê kir.[48] Astenga herî mezin ya li ber dexaleta Şêx Ebdusselam û mirovên wî, wekî avakirina Dîwana Herbî Orfî ya li Mûsilê hatî avakirin derdikevîte pêşberî me. Ji mirovên Şêx Ebdusselamî 100 kes hatibûn girtin û Dîwana Herbî Orfî dest bi darizandina wan kiribû[49]. Vê çendê kesên dixwestin teslîm bibin ji vê çendê didane paş. Jiber vê çendê Nazim Paşa bi rêbazên leşkerî û bi mehkemeya Dîwana Herbî Orfî ve çaresernebûna vê meselê têgehiştibû. Lewra di nivîsa jibo Nezareta Daxiliyê rêkirî da ragehand; çi faydeyê Dîwana Herbî Orfî di meseleya pêkînana asayîşê da nîne û bi israra Fazil Paşa ya li ser Dîwana Herbê ve dûmahî bi rûdanan nahête danê[50].

**Teslîmbûna Şêx Ebdusselam**

Wekî li jorî jî hatiye behskirin jiber bêhîvîbûna Nazim Paşa ji Fazıl Paşayî di mijara bi rêka diyalogê çareserkirina meseleya Barzanê da Safet Beg bi sifeta qeymeqam rêkiribû Barzanê. Di encama xebatên Safet Begê di gavê da dest bi xebatê kirî da, Şêx Ebdusselam nêzî 900 zelamên xwe ve dexalet kir. Şêx Ebdusselamî li hemberî kirina navenda qezayê ya Barzanê, teahhuda harîkarîkirinê di avakirina qonaxa hukûmetê, qişleya bêlûkekê û telgrafxaneyê kir. Ji aliyê Safet Begê ve li ser vê çendê hem jibo Nazim Paşa hem jî jibo Fazil Paşa name hate nivîsîn û ji bilî vê agahiya xirabûna 1327 xanî û 44 mizgeft û dêran yên heta niha di devêrê da ragehand. Li ser vê çendê Nazim Paşa, Nezareta Herbiye ji vê rewşê agahdar kir û bi dûmahîhatina meseleya Barzanê ragehand[51]. Fazil Paşa li ser van xebatên Safet Begê di nivîsa jibo Nezareta Daxiliye rêkirî da, sererayî hebûna lihevhatina li ser diristnebûna qebûlkirina dexaleta Şêxî ya di nivîsînên li navbera Babi Alî û Wîlayeta Mûsilê da, şaşbûna xwe li ser ji aliye Safet Begê ve qebûlkirina dexaleta Şêxî îfade kir. Nezaretê jî di bersivê da nivîsî, bixwe 8 û 9ê Xizîranê tu dê biçiye li Bexdayê û jibo encamdaneke ciwan jibo vê meselê hun dê hevdîtinekê bi Nazim Paşa ra biken[52].

Di vê navberê da digel belavbûna gotegotên derheqê qebûlkirina dexaleta Şêx Ebdusselamî û hevalên wî û serbestkirina girtiyên di Dîwana Harba Orfî da dihatin darizandin, hinek nerazîbûn derkeftin meydanê[53]. Ji aliyê parlementerên Mûsilê Fazil Beg û Dawûd Begê ve derbarê encamdana aloziyên ji par were li Wîlayeta Mûsilê berdewam diken da çi hatiye kirin, ji Meclîsa Mebû'sanê agahî hatine xwestin. Di bersiva hatiye dayîn da berdewambûna darizandina kesên ji eşîretên Hemewend û Barzan yên hatine girtin di Dîwana Herba Orfî da, hate ragehandin. Ji bilî vê, agahiyên bi xweşbûna şertên demsalê ve di bin serbaziya Safet Begê hêzeke leşkerî jibo deverê hatiye hinartin û Se'dî Axa û kurên wî yên reva Şêxê Barzanê sanahî kirî û girtina wî paşêxistî jî li ber sewqkirina Diwana Herba Orfî ya Mûsilê ne, hatine ragehandin[54]. Wekî ji vane hemîyan tête têgehiştin; jiber ne guncawbûna navbera Waliyê Bexdayê Nazim Paşa û Babi Alî aqibeta rewşa Şêxî hêj diyar nebûye. Lê belê Şêx û hevalên xwe bi agahdariya Safet Begê ve dest bi niştecihbûna Barzanê kirine.

Nazim Paşa, jibo çareserkirina vê aloziyê di 15 û 19yê Xizîranê ser li Meclîsa Mebû'sanê da û behsê bi encamhatina meseleya Barzanê ve Şêxê Barzanê û axayên dî yên dexalet kirî hewil diden da teahudên xwe bi cih bînin, kir û jiber vê çendê daxwaza biryardanê jibo qebûlkirina dexaleta wan kir. Meclîsa Mebu'sana ev mesele muzakere kirî jî derbarê Şêxê Barzanê û hevalên wî da jiber serê xwe çemandina Şêxî jibo deshilatdariya dewletê, vê gavê jiber munasîbbbûna 'efûkirina wan ya jibo meslehetê dewletê biryara rawestandina te'qîbata leşkerî ya li dû helwest û rewşa wan, da. Digel vê çendê derbarê ji aliye rêveberiya deverê ve di bin kontrol û çavdêriyê da girtina wan ya bi awayekî dijwar biryar da[55]. Di vê navberê da Nazim Paşa daxwaza Fazil Paşa ya cudabûna ji wezîfeya waliyatiya Mûsilê ya jiber pirsgirêkên tendûristiyê diyar kir û li ser vê çendê her çend ji waliyatiyê hatibîte wergirtin jî bi temamî ji wezîfê cudabûna wî heta dûmahiya sala 1910ê vekêşa[56]. Fazil Paşa di dema wezîfa xwe da bi awayekî berdewam li hemberî biryarên derbarê rawestandina te'qîbata leşkerî ya li dijî Şêx Ebdusselam û rawestandina darizandina girtiyên di Dîwana Harba Orfî da, pê xwe li darê rikê dana[57]. Ji ber vê yekê darizandina hinek kesên jiber meseleya Barzanê hatine girtin di Dîwana Herba Orfî da heta sala 1911ê dewam kiriye[58].

**Di Serdema Aştiyê da Şêx Ebdusselam Barzanî**

Bi encama xebatên Waliyê Bexdayê Nazim Paşa, pirsgirêkên di navbera Şêx Ebdusselam û desthilatdariya Osmanî da ber bi çareseriyê ve çûn. Di vê navberê da Nazim Paşayê di 15ê Adara 1911ê da ji waliyatiya Bexdayê hatî wergirtin di hikûmeta Kamil Paşa ya 29ê Çiriya Pêşiya 1912ê hatiye avakirin da, bû Nazirê Herbiye. Di serdema vê hukûmetê da di deverê da aramî hatiye diristkirin û Şêx Ebdusselam jî digel rêveberên deverê peywendiyên baş ava kirin. Wesa ku nivîseke amadebûna xwe digel duwanzde hizar murîdên xwe ve jibo di Şerên Balqanan da di rêzên Osmanî da şerkirinê diyar kirî, jibo Babi Alî rê kir[59]. Li ser vê çendê Nezareta Daxiliyê, ji aliyê Wîlayeta Mûsilê ve jibo piştrastkirina sedaqeta Şêx Ebdusselamî ya jibo welatî û zêdekirina îtae'ta wî ya jibo hukûmetê taltîfkirina wî bi nişana Osmanî ya pileya çare ve pêdivî dît[60].

Paş derbazbûna demeke kurt piştî serdema bi coş û xuroş ya ragehandina Meşrûtiyetê jiber helwesta Îttîhad û Tereqiyê ya tekedest û mutehekkîm nerazîbûn peyda bûn. Yên dijî rêveberiya Îttîhad û Tereqiyê di 1911ê da Firqeya Hurriyet û Î'tîlafê ava kirin. Ev her du bizavên di 'eslê xwe da ji du rûyên Jon Tirkan pêkhatî derbarê rêveberiya dewletê da xudan ramanên cuda bûn. Firqeya Hurriyet û Î'tîlafê esasen fikrên "Îttîhada 'Enasiran" û "'Âdemî Merkeziyet"ê derdiêxiste pêş. Tirkitî ji dewletê ra wekî xetere didît û di polîtîkaya derve da jî giringdîtina İngilîzîstanê dipejirand[61]. Milmilaneya di navbera herdu bizavan da bi serdagirtina Babi Alî ve xilas bû. 31î Kanûna Biçûk ya 1913yê da Îttîhad û Tereqiyê bi êrîşa Babi Aliyê ve dest dana li ser rêveberiya dewletê û Nazirê Herbiye Nazim Paşa hate kuştin.

Wesa tête têgehiştin ku Şêx Ebdusselam Barzanî, geşedanên di navbera salên 1911- 1913ê da yên di nava Dewleta Osmanî da derkeftî ji nêzîk ve şopandiye. Di vê serdemê da ji cihêbûna hizr û bîrên di navbera Bizava Îttîhat û Tereqiyê û Firqeya Hurriyet û Î'tîlafê ya dijberên wan tê da kom bûyî, hesiyaye. Lewra wesa têtê têgehiştin ku fikra "'Âdemî Merkezî" ya ji aliyê Firqeya Hurriyet û Î'tîlafê ve xudanî lê dihate kirin, ji aliye wî ve jî hatiye bergermkirin. Di vê

serdemê da digel rêveberên deverê yên nêzîkî Firqeya Hurriyet û Î'tîlafê peywendiyên baş danane. Derbarê vê mijarê da em dişên Nazim Paşayê Waliyê Bexdayê, Qeymeqam Safet Begê û Es'ad Paşa wekî nimûne bideyn. Her wiha di heman demê da ev kese tûşî zordariya Îttîhat û Tereqiyê bûne.

Şêx Ebdusselam Barzanî, jibo Kurdên di nava tuxîbên Dewleta Osmanî da dijîn li dû rêbaza "Âdem-î Merkezî" bêne rêvebirin, digel şêx û giregirên deverê dest bi xebatê kir. Li dor vê çendê li Dihokê li mala Şêx Nûr Mihemedê Birîfkanî civînek pêk înandin. Di vê civînê da ev biryar hatine wergirtin: " Divêt li her pênc deverên Kurdan da Kurdî zimanê fermî bît. Divêt zimanê perwerdehiyê Kurdî bît. Qeymeqam, mudîrên nahiyeyan û karmendên dî yên têne te'yînkirin divêt Kurdî bi asteke baş bizanin. Hindî ayîna dewletê Îslam bît divêt hukmên li dadgehan têne danê pêdivî ye li dû şerîe'ta Îslamê bêne danê. Yên di meqamê darizandin û fetwayê da divêt ji mezhebê Şafiî' bin. Bacên lixwegirtiyan(mukellefan) tête wergirtin divêt li dû şerîe'tê bêne wergirtin. Bacên ne li dû şerîe'tê û bacên derveyî şerîe'tê divêt nehêne standin. Wergirtina bacan (beramberî pêkînana xizmetên mecbûrî) her wekî berê lê belê divêt ev bace jibo veçêkirina rêyên li deverên Kurdan bêne bikarînan." Ev daxwazên hatine pejirandin bi îmzeyên beşdaran ve jibo Meclîsa Mebû'san û giregirên Kurdan yên wekî Seyîd Ebdulqadir, Emîn Elî Bedirxan û Şerîf Paşa hatine hinartin.[62] Bêgûman Îttîhad û Tereqî ji van daxwazên Şêx Ebdusselamî gelek aciz bûn û eve jibo yekîti û yekgirtina dewletê wekî xetere dîtin. Di eslê xwe da Şêx û hevalên xwe bi îşaretpêdana esaseke di bernameyên partiyên siyasî yên dewletê rê ve diben da heyî ve, bi awayekî medenî daxwaza hinek daxwazên siyasî û reveberî kirine. Silêman Nazîf di nivîsa xwe ya daxwaza darizandina wezîfedarên dewletê yên harîkariya Şêx Ebdusselamî kirî ya di 18yî Tîrmehâ 1914yê jibo Nezareta Daxiliye rêkirî da, îşaretê bi vê telgrafê didet û wiha dibêjît: " Silêman Begê ji yawerên Sultan Ebdulhemîdî û piştî ji textî ladana Sultanî jiber kêmkirina pileya wî ya ji mîrlîwayê êxistî mîlazimiyê ji ordiyê îstîfa kirî û di dema serdema hukûmeta Kamil Paşa (29 Çirîya Biçûk- 23 Kanûna Biçûk 1913) da wekî qeymeqam jibo Dihokê hatî rêkirin, piştî keftina hukûmeta Kamil Paşa Şêx Ebdusselam û hinek giregirên wekî şêx û axa vexwend Dihokê û hinek daxwazên xaînane yên dê bibine sebebe parçebûna Dewleta Osmanî, pê dane nivîsînê û jibo Babi Alî rêkirin" û paşî behsê dîtina xwe ya vê belgeyê di mala Şêx Nûr Mihemedê Birîfkanî jî da diyar diket.[63] Silêman Nazîf jî herwekî Îttîhad û Tereqiyê daxwazên Şêxî yên derbarê Kurdan da yên di warên siyasî, rêveberî, aborî, civakî û perwerdehiyê jibo beqaya dewletê wekî xetere dibînît û di ser hinde ra vê rewşê jibo tesfiyekirina kesên dijî Îttîhat û Tereqiyê wekî derfetekê dibînît.

### Jinûve Xirabûna Peywendiyan

Piştî qebûlkirina dexaleta Şêx Ebdusselamî karîgeriya wî ya di deverê zêdetir lê hat û ev rewşe jî bû sebebê ji aliye rêveberên deverê ve harîkarî wergirtina ji wî ya jibo çareseriya hinek pirsgirêkên wekî komkirina bacan û aramiya deverê[64]. Bo nimûne, di kiryara Qurtasê jiber kuştina Mela Cebraîlê ji giregirên Akrê hatiye girtin da, biryara derbarê vexwendina Şêx Ebdusselam û heşt kesên Akreyî bi îddîa'ya dest tê da hebûna di vê kiryarê da ya jibo Îstînaf Muddeî' Mehkemeya Mûsilê, jiber îhtîmala xirabkirina aramiya deverê biryara rawestandina te'qîbata 'edlî hate danê[65]. Ev çende xudan karîgeriyeke mezin bûna Şêxî ya li deverê diyar diket.

Li hemberî zêdebûna karîgeriya Şêxî, ji aliyê dijberên wî ve hinek îddîa'yên bê bingeh hatin belav kirin. Li dor vê çendê di şîfreya ji aliye Cabîr Paşayê li Wanê Qumandanê Qolordiya XI. ve hatiye hinartin da, agahî derbarê zordariya Şêxî ya li ser Nestûriyan (Mesîhiyan) hatine danê. Li dû gotina Cabîr Paşa Qonsolonsê Ûrmiyê yê li Wanê hatiye nik wî û li dû agahiyên Nestûriyan jibo wî rêkirî, Şêx Ebdusselamî pênceh zelamên wan girtine û pênceh hizar pezê wan jî talan kiriye.[66] Ji bilî vê gotiye; Şêx mirovekî gelek xirab e û hetta dema ew li Ûrmiyê, hatiye li nik Qonsolonsê Rûsyayê û daxwaznameyeke hîmaye û tabîî'yeta jibo Dewleta Rûsyayê diyar diket, nivîsiye[67]. Bi rastî, di nava eşîrên di deverê da rûdanên bi vî rengî berbelav bûn. Lê belê her çawan talankirina pezekî hinde zêde ne mumkîn bît her wesa ev rûdane jî derveyî însîyatîfa Şêxî li nava eşîran da qewimiye. Babi Alî di derbarê mijarê da ji Wîlayeta Mûsilê agahî xwest û Wîlayeta Mûsilê jî di bersivê da bi encama harîkariya Şêx Ebdusselamî ve teslîmkirina şeş sed sere pezî yê hatiye talankirin jibo xudanan ragehand[68]. Di encama revîna Ebdurezaq Bedirxan ji Stenbolê û xwe spartina wî jibo Rûsyayê li ser tuxîbê Osmanî û Rûsyayê dest bi xebatên siyasî kir û vê rewşê jî ji aliye rêveberên Osmanî yên li ser tuxîban ve pêdivîdîtina di bin kontrolê da girtina şêx û âxayên Kurdan yên îhtîmala peywendî girêdana wan bi Ebdurezaqî ve heyî derêxist meydanê. Li dor vê çendê derbarê Şêxî da tirs kefte dilê wan[69] û ev rewşe jî bû sebebê derkeftina gelek îddîa'yên bêbinyad di derheqê Şêxî da[70]. Dewleta Osmanî hem jiber zêdebûna rûdanên asayîşê yên deverê hem jî jiber rêkirina telgrafên şîkayetan yên ji aliye hinek şêxên deverê ve hatî hinartin, li hemberî roj bi roj zêdebûna karîgeriya Şêx Ebdusselamî ya li deverê û nemana desthilatdariya hukûmetê pêdivîbûna wergirtina hinek tedbîran, hesiya[71]. Di nivîsa ji aliyê Qumandaniya Qolordiya XII. ya Mûsilê ve hatiye rêkirin da, jibo pêhesandina desthilatdariya hukûmetê li Wîlayeta Mûsilê, daxwaza rêkirina waliyekî bi hêz hate kirin[72]. Bi vî awayî Silêman Nazîf jibo Mûsilê wekî walî hate hinartin[73].

### Waliyatiya Mûsilê Ya Silêman Nazîf

Silêman Nazîfê di payîza 1913ê wê ve dest bi kare xwe ya nû kirî di gavê da karîgerî û hêza Şêx Ebdusselam Barzanî ya li deverê hesiya. Di serdema Şêx Ebdusselam mecbûrî revîna ber bi Îranê kirî da, di nivîsa jibo Talat Paşayê Nazirê Daxîliyê rêkirî da rewş wiha înaye ziman: " Meseleya Barzan, ji sala sêsed û bîst û şeşe (1910) were meseleyeke îrtîkabê ye. Tiştê bûye sebebê serê xwe çemandina hemî eşîret û ehalî jibo Şêx Ebdusselamî hebûna hêza leşkerî ya wî ye. Heke ev mesele îsal çareser nebûba Şêx da şerî sala dî li ber dere Mûsilê biketin. Vê gotina min wekî mubalexe nebînin. Nahiyeya Seba' Eşair ya girêdayî navenda Mûsilê jî keftiye jêr desthilatdariya Şêxî da ku çar pênc saetan ji navenda wîlayetê dûr e. Heta îrtîkabên ji aliye ordiya me ya qumandan li serî an ji ehalî an jî ji şêxên dî nehête dîtin nahête têgehiştin û nahête bawerkirin"[74]. Wekî ji vane tête têgehiştin Şêx Ebdusselam bi saya hêza xwe ya leşkerî li devera Mûsilê nufûzeke mezin peyda kiriye. Ev rewşe jî bûye sebebê ne diyarbûna desthilatdariya hukûmetê. Rêveberiya Îttihad û Tereqiyê her demekî bi çavekî şikberî berê xwe dida pêkhateyên (saziyên) Kurdan yên ji sala 1908ê pê ve Stenbol wekî navend bi kar inayî û derkeftî meydanê û xwestiye peywendiyên wan yên bi Kurdistanê ve di bin kontrole da bigirin. Jibo li deverê piştgirî peydanekirina hişmendiya Kurdînîyê ya ji vê dere belav dibît, bi berdawamî çavên xwe vekirî hêlane. Tekya Barzanê xebatên siyasî û çandî yên bizava Kurdî ya navend Stenbol şopandiye. Di nava medrese û tekyayên li deverê cihê ji hemiyan zêdetir rewaca ev weşanên Kurdan kirî Tekya Barzan bûye[75]. Herwiha di heman demê de rûdana Bidlîsê diqewimî û Ebdurezaq Bedirxan, Simkoyê Şikakî û Seyîd Taha li ser devera Îran digel Osmaniyan hevtuxîb xebatên siyasî dikirin. Lewra Şêx Ebdusselamê di Kurdistanê da yanî di qadê da xudanê civak û hêza çekdar ya herî bi rêkûpêk, li dû hizra dewletê diviyabû ji aliyê dewletê ve ji holê hatiba rakirin. Jiber vê çendê Waliyê nû hatî jibo şkandina nüfuza Şêxî derhal dest bi xebatê kir.

Silêman Nazîf, bi awayê ku Şêx Ebdusselam neşêt harîkariyê ji mûrîdên xwe yên ji derve û ji dever û eşîrên alîgir bistînît, dest bi dorpêça devera Barzanê kir. Herwesa digel hêzên

leşkerî yên di wextî da li deverên Barzan, Mizurî û Şêrwan hatine bicihkirin ve jî Şêx, bi awayekî neşêt xwed xwe li devera eşîreta xwe bilivînît dest bi dorpêçkirina wî hatiye kirin[76]. Bi vî awayî heke Şêx gelek tengav bibît da carek dî neşêt xwe bispêrît devera çiyayî ya li Hekarê ya li bakûrî, rêyên revê hatine girtin. Ji bilî dorpêçkirina Şêxî piraniya eşîretên dê bişên harîkariya Şêxî biken, di dema herekata leşkerî da an jibo bêalîbûnê an jî jibo harîkirina bo hêzên leşkerî hatine razîkirin[77]. Silêman Nazîf di nivîsa jibo Nezareta Daxiliye hinartî da, agahiya tecrîdbûna Şêxî ya ji hêza xwe ya herî sereke ya eşîretên xwe bi bixwe û digel ji dused murîdên xwe kêmtir ve hatin dorpêçkirinê ragehand û di berdewamiyê da got heke emre pêdivî jibo tenkîlkirin û te'dîbkirina Şêxî a niha nehête danê, hizra dîsa efûbûna Şêxî dê li nik xelkî peyda bibît.[78]. Di vê serdemê da li deverên Wan û Mûsilê waliyatî kirina kesên wekî Tahsîn Paşa (Hasan Tahsîn Uzer) û Silêman Nazîf yên kadîrên Îttîhad û Tereqiyê yên çavtarî, em dişên wekî sebebê herî girîng yê rakirina herekata leşkerî ya li ser Şêx Ebdusselamî bibînîn. Bi rastî çi meseleyên girîng yên bişên bibine sebeb jibo rakirina herekateke leşkerî li ser Şêxî çênebûbûn. Lê belê herdu waliyan bi berdewamî bi gelek beyanatên derew yên wekî; Şêx, dijberê desthilatdariya dewletê ye, bi Seyîd Taha û Ebdurezaq Bedirxan ra di hevkariyê da ye, ji bajarê Îranê Ûrmiyê çek û cebilxane kiriye, dixwazît derbasî bin hukmê Ûrisan bibît û hwd. ve şîkayeta Şêxî ji Babi Alî dikirin û ferman jibo rakirina herekata leşkerî dixwaztin.[79] Hem ragehandinên van herdu waliyan yên derbarê berhevkariya Şêxî ya bi rêkûpêk û bi pilan da û hem jî gelek bi sanahî dorpêçkirina Şêxî yê heçkû di amadekariya serhildanekê da nakokiyê peyda diket.

**Fîrara Şêx Ebdusselamî Ya Îranê**

Piştî dorpêçkirina deverê û xilaskirina amadehiyên leşkerî jibo girtina Şêx Ebdusselamî di Nîsana 1914ê da li ser Barzanê herekata leşkerî dest pê kir. Di 9ê Nîsanê da Silêman Nazîf, li Nahiyeya Zêbarê bi heşt sed leşker û nêzîkî şeş sed beşdarên eşîrên harîkar ve jibo hucûma li ser gundê Barzan xwe amade kir û li benda hêzên dê ji Rewandizê bên, ma. Di vê navberê da Şêxî, bi mirovên xwe yên nik yên hejmara wan nedigehiştin du sed kesan ve berheviya bergiriyê kir. Di 10ê Nîsanê da êrîşa li ser Barzanê dest pê kir[80]. Şêx Ebdusselamî her çend li hemberî hêzên leşkerî bergirî kiribît jî hem jiber zêdebûna hejmara leşkeran hem jî jiber serdestiya çek û cebilxaneyê ya hêzên leşkerî xwe ranegirt û ber bi Îranê ve xwe vekêşa[81]. Di 15ê Nîsanê da hêzên Osmanî ketine Gundê Barzanê. Li Barzanê di lêgerînên di mala Şêxî da gelek ewraq hatine dîtin. Silêman Nazîf di nivîsa ji Barzanê hinartî jibo Babi Alî da, dibêjît di nava van ewraqan da; hinek nameyên aîdî Qeymeqamê berê Safet Begê û nîzamnameya komeleya bi navê komeleya hemwelatiyan ya ji aliye wî ve hatî damezrandin û nameyeke aîdê Qonsolonsê İngilîztanê yê Mûsilê û nameya Şêxî jibo wî hinartî hwd. hebûn[82]. Piştî hîngê Silêman Nazîf ev belgene tesnîf kirine û ji Nezareta Daxiliyê ra hinartine. Li dû vê çendê belgeyên di mala Şêx Ebdusselamî da hatine dîtin ji sê beşan pêk tên. Beşa yekemîn ji name û beyanatên jibo xirabkirina asayîşa dewletê ne. Beşa duwemîn ji ewraqên derbarê wergirtina bertîlê ji aliye Es'ed Paşayê Qumandanê Qolordiyê û zabitên dî ve di dema dana tewcîha nişana Osmanî jibo Şêxî û ji hinek nivîsînên dî pêk dihat. Beşa sêyemîn jî ji nameyên tijî xiyanet yên hinek karmend û kesan pêk tên. Di nava van kesan da kesên wekî Safet Begê, Seyîd Ebdulqadir, ji Bedirxaniyan hinek kes û hwd. hene. Li dû gotina Silêman Nazîf heke ev kare jibo mehkemê bêne hêlanê Dîwana Herbî Orfî ji nav vî karî dernakevît û ev doze dê bi salan berdewam biket. Ji ber vê yekê divêt çareseriya meselê jibo rêveberiya mehellî bête hêlan da ev mesele gelek zû bête xilaskirin[83]. Bi rastî di dema şerî da peydakirina van belgeyan hemiyan di mala Şêxî da cihê şike ye. Çunkî Şêxê bi awayekî gelek bi rêkûpêk û bi pilan amadekariya serhildan kirine ve hatiye tohmetbarkirin, van ewraqan bihêlît malê û biçît ne ber aqil e. Di vê serdemê da hebûna bizava serhildanekê ya di bin serkêşiya Şêx Elî, Şêx Şehabedîn û Mela Selîm ya li devera Bidlîs û Xîzanê, xebatên siyasî yên Ebdurezaq Bedirxan digel Seyîd Taha û Simkoyê Şikakî yên li aliye Xoy û Ûrmiyê Dewleta Osmaniyan tirsandibû. Lewra jibo pêşîlêgirtina destpêkirina bizaveke muhtemel ya bi awayekî hevgirtî ya Şêx Ebdusselam jî digel wan, hizra zûtir hereketkirin û pêkînana herekata leşkerî ya li ser Şêxî li nik mirovî çêdibît[84].

**Şêx Ebdusselam Li Îranê**

Şêx Ebdusselamê li ber hêzên Osmaniyan têkçûyî digel mirovên xwe û malbatên wan yên nêzî pênsed kesan ve di 17ê Nîsanê da çûne bajarê Şinoyê yê rexê Îranê û ji wê dere jî derbazî gundê Rajanê yê Seyîd Taha bûn[85]. Waliyê Wanê Tehsîn Begê di nivîsa jibo Nazîrê Herbiyê hinartî da, digel derbazbûna Şêxî ya li aliye Îranê ve gelek girîngî wergirtina tuxîbê Îranê û tedbîrên divêt bêne wergirtin ragehand[86]. Dewleta Osmaniyan jibo di gavê da bişêt hemî çalakiyên Şêx Ebdusselamî bişopînît gelek tedbîr wergirtin. Derbarê vê mijarê da dest bi şopandina hevpeyvînên Seyîd Taha, Simkoyê Şikakî, Ebdurezaq Bedirxan yên digel rayedarên Ûrisan û rêveberên Îranî hatiye kirin. Ji bilî vane hemiyan jibo kuştina Şêx Ebdusselamî hinek xebat hatine kirin. Jibo vê çendê ji axayên Herkiyan Faxir û Hacî Axa, Şêx Celaledînê ji gundê Darul Emana girêdayî Rewandizê û birayê wî Şêx Salih[87] bîzzatîhî karê ji holê rakirina Şêxî wergirtin li ser xwe. Lê belê çi encam bi dest neêxistin.

Dewleta Osmaniyan bi rêya Şehbenderê xwe yê Ûrmiyê dest bi şopandina xebatên Şêxî yên li Îranê kir. Di belgeya ji Şehbenderiya Ûrmiyê hatiye rêkirin da agahiyên; di 22yê Nîsanê da xwe veşartina Şêxî digel deh zelamên xwe di Ûrmiyê da, heta niha mana nêzîkî pênsed zelamên wî li Şinoyê û pêxweşnebûna Ûrisan derbarê fîrarkirina bi qelebalixeke ev reng mezin ve ku ew çavêrê bi bîst sih zelamên xwe ve fîrarkirina Şêxî bûn, hatine ragehandin[88]. Nezareta Xariciyê derbarê teslîmkirina Şêx Ebdusselamî da dest bi xebatên pêdivî kir[89]. Van hewildanan hêdî hêdî berê xwe dan. Li dû nivîsa Şehbenderiya Ûrmiyê hinartî, Hakimê Îranê Î'tîmadûd- Dewle, bicihkirina mirovên Şêxî li Meraxê an jî li Erdebilê û rêkirina Şêxî bixwe jibo Tebrêzê, jibo eyaleta merkeze nivîsiye. Qonsolonsê Ûrisî jî gotiye Şêxî; tu tinê dişêy bi sêsed zelamên xwe ve li Ûrmiyê îqamet bikey û heke tu pê razî nebî tu dişêy berê xwe bideye Tebrêzê an jî welatê xwe. Wekî dî piştî vegotina hîmayenekirina wî bi awayekî resmî pê da diçît û dibêjît hatina Şêxê Barzanê digel mirovên xwe ber bi vî alî ve ji Eceman zêdetir keyfa Ûrisan nexweş kiriye[90]. Barzaniyên derbazî Îranê bûyî tûşî gelek zor û zehmetiyan bûne. Jiber ku Seyîd Taha jî êxistine bin zextê û mirovên wî hatine belavkirin, Barzanî di halekî gelek sefîl û perîşan da mane[91]. Sererayî çalakîyên îstîxbaratî yên Dewleta Osmaniyan yên li Îranê bi temamî nehatiye zanîn kanê Şêx Ebdusselamî xwe kî derê veşartiye[92]. Digel biryara ji Meclîsa Mebû'sanê hatî derêxistin ve, biryara rawestandina te'qîbatê ya berê di derheqê Barzaniyan da hatîye wergirtin hate feshkirin û biryara jinûve destpêkirina te'qîbata qanûnî hate danê[93]. Wîlayeta Musilê jî li dor vê çendê dest bi sewqkirina yên hatî girtin jibo Dîwana Herbî Orfîyê kir[94].

**Girtin û Darizandina Şêx Ebdusselamî**

Dewleta Osmaniyan li her derê Îranê li Şêx Ebdusselamî digeriya û jiber vê jî ew di şert û mercên gelek dijwar de jiyaye. Jibo girtina Şêx Ebdusselamî, Dewleta Osmaniyan xwe ji ceribandina her rêyekê nedaye paş û tiştê ji destê wê hatî kiriye. Lewra derbarê vê çendê da jibo kesên dê Şêxî bigirin an jî dê wî bikujin xelatên cazîb diyar kirine. Şêx Ebdusselam piştî bi hevdîtina digel Simkoyê Şikakî bi hevalên xwe ra ji Çariyê zivirî û dema nêzîkî Bêlûka Sînorî ya Bajêrgehê (Gever) di nava Eşîra Kardaran derbaz dibû ji aliye Ebdullahê kurê Canko ve jibo gundî hate de'wetkirin. Şêx û

hevalên wî yên qesta mêvandariyê kirî ji aliye gundiyan ve hatin girtin. Du hevalên wî yên nexwestine teslîm bibin hatine kuştin, yekî şiyaye birevît û çar hevalên wî jî digel Şêxî hatine girtin û di nîva meha Îlonê da teslîmî Bêlûka Hudûdî ya Bajêgehê hatine kirin. Lêpirsîna pêşiyê ya Şêx Ebdusselam û hevalên wî yên ji wê dere ber bi Wanê hatîne neqilkirin, li vê dere ji aliye Walî Tehsîn Begê ve hatiye kirin[95]. Jiber ku berê hizra darizandina Şêxî li Dîwana Herba Orfi ya Wanê hate kirin, ji Wîlayeta Mûsilê derbarê rûdana dawiyê dereceya mehkûmiyeta Şêx Ebdusselamî ya ji aliyê Dîwana Herba Mûsilê ve hatiye danê, hate xwestin[96]. Wîlayeta Mûsilê di bersiva xwe da wiha cewab da; " vê gavê çi mehkûmiyetên Şêxî yên qerar pê hatine danê nînin. Cezayê qanûnê jibo van cûre kesan peyda kirî darvekirin e. Divêt yê navborî demildest jibo Mûsil bête rêkirin"[97]. Şêx Ebdusselam ji Wanê hatiye rêkirin jibo Mûsilê û ji aliyê Dîwana Herba Orfi ya li wê derê hatiye damezrandin ve hatiye darizandin.

Di encama darizandina ji aliye Dîwana Herba Orfi ya Mûsilê ya di 16yî Çiriya Paşî ya 1914ê hatiye kirin da ev biryar hatine danê: "Şêx Ebdusselamê Barzanî, ji çend salan were bi desîseyên cuda cuda ve ji xelkê nezan yê êxistî jêr karîgeriya xwe da hêzeke çekdar ya bi navê Dêwane damezrandiye û dever êxistiye di bin deshilatdariya xwe da. Çawan digel xelkê bûne tabiê' wî ve hukûmet nas nekiriye herwesa jî zext û zordarî li xelkê tabiî'yeta wî qebûl nekirî kiriye. Peywendî digel qonsolonsên biyanî û hinek kesên xaînên wetenî ra kiriye. Her çend pabendîkirina bi hukûmetê jê hatibîte xwestin jî ber nehatiye û li hemberî hêzên hatine ser wî çek bi kar aniye û bûye sebebe kuştina leşkeran. Jiber sabîtbûna van tawanan bi delaleta fiqra duyemîn ya maddeyê pênceh û pêncê ya qanûnnameya humayun ya cezayê mulkiye û bi tewfîqa maddeyê pênceh û heftê, jibo Şêx Ebdusselam û jibo axayên xudan nufûz yên digel wî girtî yên wekî; ji gundê Nêrwe Teter Begê kurê Elî Begê, ji gundê Babsîva (Basîfa) Mihemed Emîn Axa kurê Ezîz[98], ji gundê Bigulê Ebdî Axa, ji gundê Nêrwe Mihemed Axa û Eliyê kurê Mihemed Emîn Axa bi wîcahen û jibo Seîdê kurê Feqe Ebdurehman, ji gundê Mizurî Xuşoyê kurê Ebdî, Hecî Duriyê Şêrwanî jî xiyaben biryara sêdaredanê hatiye danê"[99]. Biryarên sêdaredanê, bi îmzeya Nazirê Herbiyê Enwer Paşa û Sedrezamî ve di 13yî Çiriya Paşî 1914ê da pêşkêşî îmzeya Padîşah Sultan Mihemed Reşadî hatiye kirin û hatiye erêkirin[100]. Jibo Teter Begê kurê Elî Begê ji gundê Nêrwe û Mihemed Emîn Axayê kurê Ezîz Axayê ji gundê Babsîfa yên navê wan di îradeyî seniyê da hatine jibîrkirin serejinû îradeyî seniye hate derêxistin[101]. Dîroka sêdaredana Şêx û hevalên wî herçend bi esehî nediyar jî bît behsê 12yî Kanûna Biçûk 1914 û heyva Kanûna Mezin ya 1915ê tête kirin[102].

### Nirxandin û Encam

Şêx Ebdusselam Barzanî yê di navbera salên 1908-1914ê da di nava tuxîbên Wîlayeta Mûsilê ya girêdayî Dewleta Osmaniyan da jiyayî, bi saya nüfuza xwe ya ayinî û siyasî, pêkhateyeke ayînî û siyasî ya ji eşîrên cuda cuda yên bi dora navê Barzaniyan kombûyî damezrandiye. Ev pêkhate bûye xudanê hêzeke çekdarî ya bi navê "Dêwane". Ev hêza Şêx xudanê wê, ji aliyê Dewletê ve wekî xetere hatiye dîtin. Jibo belavkirina vê hêzê û li deverê şaxvedana desthilatdariya Dewletê çalakiyên cuda cuda hatine kirin. Rêveberiya Îttihad ve Tereqiyê jibo ji holê rakirina vê hêzê xwe vebijêrkên leşkerî sipartiye lê bele rêveberên dijberê Îttihad ve Tereqiyê rêbaza bi rêya diyalogê ve kontrolkirina vê hêzê dane ber xwe.

Şêx Ebdusselamê hêj berî Şerê Cîhanê yê Yekemîn dest bi çalakiyan kirî, li çavî serokên Kurd û saziyên wan yên di navenda Stenbolê çalakiyên siyasî û dîplomatîk rê ve dibirin, di Kurdistanê da li ser sahayê wekî girîngtirîn kesayetiyê ayînî û siyasî derkeftiye meydanê û bi civaka xwe ya sazgar û bi hêza xwe ya çekdar ve derkeftiye pêş. Çawan digel rêveberên Dewlata Osmaniyan peywendiyên wî yên baş û xirab çêbûne herwesa digel nûnerên dewletên biyanî û serokên Kurd yên dî jî di nava peywendiyê da bûye.

Demekî kurt berî destpêkirina Şerê Cîhanê yê Yekemîn da girtina wî û sêdaredana wî çawan rê li ber bikarînana siyaseteke karîger ya Barzaniyan girtîbît herwesa di lêkvekirina piştî şerî da kar li ser çi bidestneêxistina gelê Kurd jî kiriye. Şêx Ebdusselamê di berdewamiya serdemê Dewleta Osmanî da digel meseleya Bidlîs û Xîzanê wekî kesekî ji yekemin mexdûrên biryara sêdaredana siyasî ya ji serokên Kurdan ra hatîye danê yê navê xwe li dîrokê hêlayî ye. Daxwazên siyasî yên Şêx Ebdusselamî yên ji rêveberiya Osmaniyan hatine xwestin heman daxwazên miletê Kurd in yên heta roja me ya îro di wê rêkê da bizavê diken. Bizava Şêx Ebdusselam Barzanî li Îraqê binyadê bizava miletê Kurd danaye.

## PERAWÊZ

1. Di îcazetê da îfadeyên "Molla Ebdullah b. el-Hac Molla Muhammed eş-Şafii el-Kurdi eş- Şehir bi'l-Barzani" cih digirît. Ferset Mer'î Îsmaîl, "Vasiyyetu Mevlânâ Hâlid li Halifetihi Seyyid Taha en-Nehri", Uluslararası Mevlânâ Hâlid-i Bağdadî Sempozyumu-Van, TDV, Ankara 2012, s. 129.
2. Dr. Arafât Kerem Stûnî, el-Hayatu'd-Dîniyye min Nehrî ilâ Barzan, Aras Matbaası, Erbil 2010, s. 29- 39; Haşim Şêrwanî, Devera Barzan Cografya, Dîrok, Keltûr, Çapxaney Wezaretî Roşenbîrî, Hewlêr 2008, 51- 53.
3. Arafât Kerem Stûnî, b.n.b., s. 27
4. Arafât Kerem Stûnî, b.n.b., s. 113. Wesa tête têgehiştin ev berheme li sala 1258 (1842) hatiye nivîsîn. Bnr; Arafât Kerem Stûnî, b.n.b, s.109.
5. Arafât Kerem Stûnî, b.n.b., s. 32, 37.
6. Mesud Barzani, Barzani ve Kürt Ulusal Özgürlük Hareketi, (Çev. Vahdettin İnce), Doz Yayınları, İstanbul, 2004, s. 24.
7. Keyder, Çağlar, Türkiye'de Devlet ve Sınıflar, İletişim Yayınları, İstanbul 2007, s.73.
8. Örs, Orhan, "Kuruluşundan Birinci Dünya Savaşına Kadar İttihat ve Terakki Cemiyeti", Ankara Üniversitesi Türk İnkılâp Tarihi Enstitüsü Atatürk Yolu Dergisi, Sayı: 51, Bahar 2013, s. 714.
9. Artuç, Nevzat, "Osmanlı Devleti'nin Son Dönem Irak Politikasına Bir Örnek: Nazım Paşa'nın Bağdat Valiliği (25 Çiriya Mezin 1909–15 Mart 1911)", Belleten, C. LXXIV, Ankara, 2010, Sayı: 271, s. 834.
10. BOA. DH. MKT. 2708/91(23 Zîlhîcce 1326/ 16 Kanûna Mezin 1909).
11. BOA. DH. MÜİ. 1/73. Lef: 7-9 (21 Temmuz 1325); BOA. DH. MKT. 2907/44 (5 Şe'ban 1327/ 22 Tebax 1909).
12. W. A. Wigram, İnsanlığın Beşiği Kürdistan'da Yaşam, (Çev: İbrahim Bingöl), Avesta Yayınları, İstanbul 2004, s. 193.
13. BOA. DH. MÜİ. 1/73. Lef: 4 (25 Temmuz 1325/ 7 Tebax 1909).
14. Di wî demî da qezayek bû ser bi Mûsilê ve lê niha qezayek e ser bi Dihokê ve. Deverên Zêbar û Barzan di nava tuxîbên vê qezayê da bûn.
15. BOA. DH. MÜİ. 1-4/64 (6 Teşrînî Ewwel 1325/19 Çiriya Biçûk 1909).
16. BOA. DH. MÜİ. 1-7/7, Lef: 23 (17 Ağustos 1325/ 30 Tebax 1909).
17. BOA. BEO. 3363/272417. Lef: 3 (15 Ağustos 1325/ 28 Tebax 1909).
18. BOA. DH. MÜİ. 1/7, Lef: 22 (18 Ağustos 1325/1 Îlon 1909).
19. BOA. DH. MÜİ. 1-4/64 (6 Teşrînî Ewwel 1325/19 Çiriya Biçûk 1909).
20. BOA. DH. MÜİ. 1-3/41. Lef: 12 (26 Ağustos 1325/8 Îlon 1909).
21. BOA. DH. MÜİ. 1-3/41. Lef: 8 (1 Îlon 1325/14 Îlon 1909).
22. BOA. DH. MÜİ. 1-3/41. Lef: 9 (5 Îlon 1325/18 Îlon 1909).
23. BOA. DH. MÜİ. 1-2/73. Lef: 3 (8 Îlon 1325/21 Îlon 1909).
24. BOA. DH. MÜİ. 1-9/15. Lef: 13 (21 Kanûna Ewwel 1325/3 Kanûna Mezin 1910).
25. BOA. DH. MÜİ. 1-3/60. Lef: 1, 2 (20 Îlon 1325/3 Çiriya Biçûk 1909).
26. BOA. DH. MÜİ. 1-9/15. Lef: 13 (21 Kanûna Ewwel 1325/3 Kanûna Mezin 1910).
27. BOA. DH. MÜİ. 1-9/15. Lef: 24 (7 Kanûna Ewwel 1325/20 Kanûna Biçûk 1909).
28. BOA. BEO. 3673/275448. Lef: 4 (18 Teşrînî Sanî 1325/1 Kanûna Biçûk 1909).
29. BOA. BEO. 3673/275448. Lef: 7 (19 Teşrînî Sanî 1325/2 Kanûna Biçûk 1909).

30. BOA. BEO. 3673/275448. Lef: 4,6 (17 Teşrînî Sanî 1325/30 Çiriya Mezin 1909, 18 Teşrînî Sanî 1325/1 Kanûna Biçûk 1909).
31. BOA. BEO. 3673/275448. Lef: 9 (21 Teşrînî Sanî, 1325/4 Kanûna Biçûk 1909).
32. BOA. DH. MÜİ. 1-6/14. Lef: 6 (26 Teşrînî Sanî 1325/9 Kanûna Biçûk 1909).
33. BOA. DH. MÜİ. 1-6/14. Lef: 5 (28 Teşrînî Sanî 1325/11 Kanûna Biçûk 1909).
34. BOA. DH. MÜİ. 1-5/50. Lef: 1 (25 Teşrînî Sanî 1325/8 Kanûna Biçûk 1909).
35. BOA. DH. MÜİ. 1-6/14. Lef: 4 (28 Teşrînî Sanî 1325/11 Kanûna Biçûk 1909).
36. BOA. DH. MÜİ. 1-6/27. Lef:4 (29 Teşrînî Sanî 1325/12 Kanûna Biçûk 1909).
37. BOA. DH. MÜİ. 1-6/14. Lef: 3 (29 Teşrînî Sanî 1325/12 Kanûna Biçûk 1909).
38. BOA. DH. MÜİ. 1-6/27. Lef: 3 (1 Kanûna Ewwel 1325/14 Kanûna Biçûk 1909).
39. BOA. BEO. 3682.276123 (15 Kanûna Ewwel 1325/28 Kanûna Biçûk 1909).
40. BOA. DH. MUİ. 1-9/15. Lef:18 (22 Kanûna Ewwel 1325/4 Kanûna Mezin 1910).
41. BOA. DH. MUİ. 1-9/15. Lef: 9 (17 Kanûna Ewwel 1325/30 Kanûna Biçûk 1909).
42. BOA. DH. MUİ. 1-9/15. Lef: 1, 6 (11 Şibat 1325/24 Şibat 1910).
43. BOA. DH. MÜİ. 1-9/40, Lef: 1, 2 (26 Mart 1326/7 Nîsan 1910).
44. Artuç, Nevzat, "mq.n.b.", s. 833- 870.
45. BOA. DH. MUİ. 92-1/34, Lef: 4 (27 Şibat 1325/12 Adar 1910).
46. BOA. DH. ŞFR. 662/140 (24 Nisan 1326/7 Gulan 1910).
47. BOA. DH. ŞFR. 662/143 (25 Nisan 1326/8 Gulan 1910).
48. BOA. DH. MUİ. 1-10/16, Lef: 2 (11 Mayıs 1326/24 Gulan 1910).
49. BOA. DH. MUİ. 1-9/15. Lef: 13 (21 Kanûna Ewwel 1325/3 Kanûna Mezin 1910).
50. BOA. BEO. 3784/283727. Lef: 3,4 (21 Mayıs 1326/3 Xizîran 1910).
51. BOA. DH. MUİ. 1 -11/21. Lef: 14 (26 Mayıs 1326/8 Xizîran 1910).
52. BOA. DH. MUİ. 1 -11/21. Lef: 14 (26 Mayıs 1326/8 Xizîran 1910).
53. Bo nimûne yek ji kesên li hemberî qebûlkirina dexaleta Şêx Ebdusselamî daxwaznameya îtîraz daye Meqama Sedrazamî Şemaşeyê cemae'ta Keldanî ya Gundê Eredina ye. Bkz: BOA. DH. MUİ. 1 -11/21. Lef: 15 (29 Mayıs 1326/11 Xizîran 1910).
54. BOA. DH. MUİ. 1 -10/39. Lef: 2, 3, 4, 5 (17 Cemazeyî Axîr 1328/26 Xizîran 1910).
55. BOA. MV. 142/31 (8 Temmuz 1326/21 Tîrmeh 1910); BOA. BEO. 3784/283727. Lef: 1 (13 Temmuz 1326/26 Tîrmeh 1910).
56. BOA. DH. MÜİ. 1 -11/15. Lef: 3,4 (8 Rebîû'l Ewwel 1328/20 Adar 1910); BOA. DH. MÜİ. 1 -11/15. Lef: 2 (11 Şibat 1325/24 Şibat 1910).
57. BOA. DH. ŞFR. 663/141 (27 Temmuz 1326/9 Tebax 1910).
58. BOA. DH. ŞFR. 665/76 (11 Kanûna Sanî 1326/24 Kanûna Mezin 1911).
59. BOA. BEO. 4118/308812. Lef: 2 (13 Teşrînî Sanî 1328/26 Çiriya Mezin 1912).
60. BOA. İ.TAL. 484/45 (10 Remezan 1331/13 Tebax 1 913).
61. Birinci, Ali, "Hürriyet ve İtilaf Fırkası", TDV İslam Ansiklopedisi", TDV. Yay. İstanbul 1998, C: 18, S. 508, 509.
62. Sıddık ed- Demeluci, İmaretu Bahdinan el- Kurdiyye ev İmaret'ul- İmadiyye, (Taqd. û Mur: Ebdulfettah Elî Botanî), Weş. Aras, Erbil 1999, s. 85- 93.
63. BOA. DH. ŞFR. 433/129 (5 Temmuz 1330/18 Tîrmeh 1914).
64. Jibo komkirina bacan ji Eşîreta Koçer ya Herkiyan rêveberiya Osmaniyan harîkarî ji Şêxî wergirtiye. Bnr. W. A. Wigram, b.n.b., s. 188- 190.
65. BOA. BEO. 4146/310944. Lef: 1, 2 (13 Rebîû'l Ewwel 1330/2 Adar 1912).
66. Eşîreta navborî Eşîreta Tuxîbiyan ya Nestûrî ye. Şêxî di dema xwe veşartina xwe da li beramberî harîkariyên vê eşîretê hinek koz û mêrgên di devera xwe texsîsî wan kiribû. Di vê navberê da bêyî însiyatîfa wî pezê vê eşîretê hatibûn talan kirin.
67. BOA. BEO. 4171/312769, Lef: 2, 4 (4 Cemazeyî Ewwel 1331/11 Nîsan 1913).
68. BOA. BEO. 4189/314115 (26 Recep 1331/1 Tîrmeh 1913).
69. BOA. BEO. 4175/313096 (14 Cemazeyî Axîr 1331/21 Gulan 1913).
70. BOA. BEO. 4177/313239 (22 Cemazeyî Axîr 1331/29 Gulan 1913).
71. BOA. BEO. 4192/314393 (2 Şe'ban 1331/7 Tîrmeh 1913).
72. BOA. BEO. 4197/314739 (16 Şe'ban 1331/21 Tîrmeh 1913).
73. BOA. İ. MMS. 170/1331 (14 Şewwal 1331/16 Îlon 1913).
74. BOA. DH. ŞFR. 424/79 (9 Nîsan 1330/22 Nîsan 1914).
75. Sıddık ed- Demeluci, b.n.b., s. 85, 86.
76. BOA. DH. ŞFR. 421/63 (5 Mart 1330/18 Adar 1914); BOA. DH. ŞFR. 421/18 (1 Mart 1330/14 Adar 1914).
77. BOA. DH. ŞFR. 39/6 (2 Mart 1330/15 Adar 1914).
78. BOA. DH. ŞFR. 421/111 (9 Mart 1330/22 Adar 1914).
79. BOA. BEO. 4266/319908 (9 Rebîû'l Axîr 1332/7 Adar 1914); BOA. DH. ŞFR. 422/59 (16 Mart 1330/29 Adar 1914); BOA. DH. ŞFR. 422/92 (19 Mart 1330/1 Nîsan 1914).
80. BOA. DH. ŞFR. 423/68 (27 Mart 1330/9 Nîsan 1914).
81. BOA. DH. ŞFR. 40/29 (3 Nisan 1330/16 Nîsan 1914).
82. BOA. DH. ŞFR. 424/21 (2 Nisan 1330/15 Nîsan 1914).
83. BOA. DH. ŞFR. 424/53 (7 Nisan 1330/20 Nîsan 1914).
84. BOA. DH. ŞFR. 424/88 (10 Nisan 1330/23 Nîsan 1914).
85. BOA. DH. ŞFR. 424/62 (8 Nisan 1330/21 Nîsan 1914); BOA. DH. ŞFR. 40/93 (12 Nisan 1330/25 Nîsan 1914).
86. BOA. DH. ŞFR. 424/83 (9 Nisan 1330/22 Nîsan 1914).
87. BOA. DH. ŞFR. 425/6, 29 (12 Nisan 1330, 14 Nisan 1330/25Nîsan 1914, 27 Nîsan 1914); BOA. DH. ŞFR. 428/33 (15 Mayıs 1330/28 Gulan 1914).
88. BOA. DH. ŞFR. 425/48 (15 Nisan 1330/28 Nîsan 1914).
89. BOA. DH. ŞFR. 40/126 (19 Nisan 1330/2 Gulan 1914).
90. BOA. DH. ŞFR. 425/94 (15 Nisan 1330/28 Nîsan 1914).
91. BOA. DH. ŞFR. 41/23 (6 Mayıs 1330/19 Gulan 1914).
92. BOA. DH. İD. 176/69 (26 Temmuz 1330/8 Tebax 1914).
93. BOA. MV. 189/17 (21 Mayıs 1330/3 Xizîran 1914).
94. BOA. DH. ŞFR. 429/54 (25 Mayıs 1330/7 Xizîran 1914).
95. BOA. DH. ŞFR. 442/38 (13 Îlon 1330/26 Îlon 1914).
96. BOA. DH. ŞFR. 45/26 (2 Ağustos 1330/15 Tebax 1914).
97. BOA. DH. ŞFR. 441/40 (5 Îlon 1330/18 Îlon 1914).
98. Navên Teter Begê kurê Elî Begê yê ji gundê Nêrwe û Mihemed Emîn Axayê kurê Ezîz yê ji gundê Basîva di nivîsa jibo Babi Alî hatiye hinartin da hatibû jibîrkirin. Lewra di 17yî Çiriya Mezin ev herdu nave jî hatin lêzêdekirin û dîsa jibo Babi Alî hate hinartin (BOA. İ. HB. 163/12. Lef: 3 (4 Teşrînî Sanî 1330/17 Çiriya Mezin 1914).
99. BOA. İ. HB. 165/1. Lef: 1 (3 Teşrînî Sanî 1330/16 Çiriya Mezin 1914).
100.BOA. İ. HB. 163/12. Lef: 4 (7 Muharrem 1333/25 Çiriya Mezin 1914).
101.BOA. İ. HB. 165/1. Lef: 3 (3 Rebîû'l Ewwel 1333/19 Kanûna Mezin 1915).
102.Mesut, Barzani, b.n.b., s. 27.

## Jêder:

### I. Jêderên Erşîvan


Başbakanlık Devlet Arşivleri Genel Müdürlüğü Osmanlı Arşivi Daire Başkanlığı
Bab-ı Ali Evrak Odası Evrakı (BEO)
Dahiliye Nezareti İdare Evrakı (DH.İD)
Dahiliye Nezareti Mektubi Kalemi (DH.MKT)
Dahiliye Muhaberat-ı Umumiye İdaresi Evrakı (DH.MUİ)
Dahiliye Nezareti Şifre Evrakı (DH.ŞFR)
İrade Harbiye (İ.HB)
İrade Taltifat (İ.TAL)
Meclis-i Vükela Mazbataları (MV)


### II. Jêderên Dî


Artuç, Nevzat, "Osmanlı Devleti'nin Son Dönem Irak Politikasına Bir Örnek: Nazım Paşa'nın Bağdat Valiliği (25 Kasım 1909–15 Mart 1911)", Belleten, C. LXXIV, Ankara, 2010, Sayı: 271.

Birinci, Ali, "Hürriyet ve İtilaf Fırkası", TDV İslam Ansiklopedisi", C: 18, TDV Yayınları, İstanbul 1998.

Dr. Arafât Kerem Stûnî, el-Hayâtu'd-Dîniyye min Nehrî ilâ Bârzân, Aras Matbaası, Erbil 2010.

Ferset, Mer'i İsmail, "Vasiyyetu Mevlânâ Hâlid li Halifetihi Seyyid Taha en-Nehri", Uluslararası Mevlana Halid-i Bağdadi Sempozyumu, Van, TDV, Ankara 2012.

Haşim Şêrwanî, Devera Barzan Cografya, Dîrok, Keltûr, Çapxaney Wezaretî Roşenbîrî, Hewlêr 2008.

Keyder, Çağlar, Türkiye de Devlet ve Sınıflar, İletişim yayınları, İstanbul 2007.

Mesud Barzani, Barzani ve Kürt Ulusal Özgürlük Hareketi, (Çev. Vahdettin İnce), Doz Yayınları, İstanbul, 2004.

Örs, Orhan, “Kuruluşundan Birinci Dünya Savaşına Kadar İttihat ve Terakki Cemiyeti”, Ankara Üniversitesi Türk İnkılâp Tarihi Enstitüsü Atatürk Yolu Dergisi, Sayı: 51, Bahar 2013.

Sıddık ed- Demeluci, İmaretu Bahdinan el- Kurdiyye ev İmaret’ul-İmadiyye, (Taqd. û Mur. Ebdulfettah Elî Botanî), Weş. Aras, Erbil 1999.

W. A. Wigram, İnsanlığın Beşiği Kürdistan’da Yaşam, (Çev: İbrahim Bingöl), Avesta Yayınları, İstanbul 2004.


# PÊVEK

## PV-1. BELGENAME






**Belge-1.** Îcazetnameya Mela Ebdullah Barzanî ji Mela Yehyayê Mizurî wergirtî



**Belge-2.** Îcazetnameya Mela Ebdullah Barzanî ji Mela Yehyayê Mizurî wergirtî



TELEGRAMME


L'état n'accepte aucune responsabilité à raison du service de la télégraphie

| N° du dépôt | Nombres des mots | Group | Date du dépôt | Heures | Minutes | Matin ou Soir | Voies | Ind. par lesquels |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|

OSMANLI ARŞİVİ
DH.MUİ
1-6 | 14 | 5

BOA. DH. MUİ. 00001.6.00014.005

**Belge-3.** Nivîsa Seyîd Ebdulqadirê Nehrî ya derbarê amadebûna Şêx Ebdusselamî jibo dexaletê radigehînît


T.C. BASBAKANLIK OSMANLI ARSIVI DAIRE BASKANLIGI (BOA)

TELEGRAMME تلغرافنامه

دولت علیهٔ عثمانیه تلغراف اداره‌سی

ADMINISTRATION DES TELEGRAPHES DE L'EMPIRE OTTOMAN

L'etat n'accepte aucune responsabilité à raison du service de la télégraphie

| Retransmission ou Expedition | | | | | RECEPTION | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| N° | | Date | | Signature de l'employé | Signature de l'employé | Date | Reçu de | N° d'ordre |


De / Pour / Nº / Date / M. / Voie / Indic. Eventuelles

OSMANLI ARŞİVİ
BEO
4118 | 308812 | 2

BEO.004118.308812.002


**BOA. BEO. 4118/308812**


**Belge-4.** Nivîsa Şêx Ebdusselamî ya derbarê daxwaza beşdarbûna li Şerê Balqanan




**BOA. DH. MUİ. 0092.1.00034.004**


**Belge-5** Nivîsa ji aliyê Şêx Ebdusselam û hevalên wî ve jibo Nezareta Daxiliye hatiye hinartin





**BOA. I.HB. 00163.00012.004**

**Belge-6.** Îradeya Seniye ya sêdaredana Şêx Ebdusselam û hevalên wî pesend kirî



**BOA. İ.HB. 00165.00001.001**

**Belge-7**. Berperê pêşiyê yê ewraqa mehkemê ya derbarê Şêx Ebdusselam û hevalên wî da biryara sêdaredanê dayî



**BOA. İ.HB. 00165.00001.001**

**Belge-8**. Berperê dawiyê yê ewraqa mehkemê ya derbarê Şêx Ebdusselam û hevalên wî da biryara sêdaredanê dayî